



A large banner for a protest in Rojava, Syria, featuring the text "Saziyên civaka sivîl li rojavayê kurdistanê.. dikarîbûn çî bikin" (Civilian organizations in Rojava.. could do something). The banner includes the "Welat" logo and date "01/05/2016". Below the banner is a photo of a protest with people holding signs that say "Hêza Kurdan yekê YPG - Pêşmerge" and "AVA".

PEYVA WELAT

Em ê li ser kêfê jî bini-
visînin.

Aras Yûsiv

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- MehaneSernivîser:
Aras YûsivDesteya rêvebir:
Mihemed Zekî MihemedDizayner:
Hesen BerzencîTêbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna
xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

2

Çanda her miletekî neynikeke ji jiyana wî re, di hundirê wê de kêf, êş, paşeroj, hêvî, şikeştin, dîrok, pêşketin, helbest, çîrok, roman û eivnî, ...têne nivîsandin. Lewra di jiyana gelek milletên ku di bin ştemkariyê de ne yan derbas bûne, beşekî mezin ji çanda wan wêneyên jiyanekê xemgîn, belengaz û di bin zordariyê de dikşîne, hevdem li aliyê din milletên ku bi azadî jiyan kiribin an kirine û dikin di çanda wan de wêneyên din ji jiyanê tene dîtî, helbet di çanda wî milletî de û ji ber ku jiyan bi wî rengê xweş derbas dibe, çand bi xwe jî pêş dikeve û zimanê wê tê guhertin û nema gotinên girêdayî sitemkarî û bêzariyê derbas dibin.

Dibe ku milletê kurd ji wan milletên ku beşekî mezin ji dîroka xwe di bin bînpêkirin û zordariyê de derbas kiriye- ev ji bilî ku rewşa bînpêkirina vê çandê bi xwe ji aliyê hemî dewletên ku Kurdistan dagirkirine ev çand qedexe kirine- hiştiye ku piraniya berhemên kurdî ta yên sinemeya wan bi gelemperî li ser vî jiyanê rawestî û roniyê bidine van aliyên.

Û weku her çandek hevdema jiyanê milletê xwe ye, çanda kurdî jî nêzikî destkeftî û serkeftinên ku wan li başûrê Kurdistanê bi dest xistine bûye, û îro tevî ku hîn şer li rojavayê Kurdistanê ranewestiyaye û tevî rewşa siyasî ya kurdî

li rojavayê Kurdistanê di nav gelek pîrsgirêkan derbas dibe, lê hin dîmenên xweşik ku ev çand nêzik wê dibe îdî derdikevin holê.

Ji mafê her kesekî kurd e weku her mirovekî di bin serweriya welatê xwe de dijî, ew jî bi wê yekê şa bibe û ked û xebata salên dirêj ji têkoşîna milletê wî berhemên xwe bigirin û çanda kurdî ya ku li ser qonaxên xemgîn çî yên nûjen an yên Kevin nivîsandiye, li ser jiyana wî milletî ku bê rawestan ber bi azadiya xwe ve diçe û bigihêje wê jî binivîsîne.

Di wê demê de wê çandê kurdî ya din hebe, çandê ku tenê karê milletê xwe di rîya avakirina welatekî pêşketî tomar bike, da ku nîfîşên nû li van rojan vegerin û bibînin ku azadî û kêf bi wan û dîroka wan dikeve. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

Dilsozî bo Xebatkara Jibîrbûyî .. Rewşen Bedirxan

Izedîn Salih

Rewşen Bedirxan, yek ji jinên Kurd e yên ku navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka Kurdî ya Kevin û nûjîn de xêz kirine, bi xebata xwe ya bêhempa di ber ziman û netewa Kurd de, ku ew ji nav dawîtrîn kes bû yên ku ji binçeqa Bedirxaniyan (Azîziyan) mabûn, bi zimanê bedirxanî daxivî, herwiha bi hezkirina xwe bo zimanê Kurdî û xwesteka xwe bo pêşxistina wî ji zayînê ve ta bi koça xwe ya dawî jî navdar bû, dîmek ew yekem jina Kurd bû ku bi zimanê Kurdî yê latînî nivîsand û di Kovara Hawarê 1932z de ya ku li Şamê ji aliyê mêrê wê Mîr Celadet Bedirxan dihate weşand.

Xebatkara Kurd Rewşen di 11ê Tîrmehê de ji sala 1909an de li bajarê Qeyserê ji dayik bû, ku bavê wê Mîr Salih bedirxan sergûnî wî bajarî bûbû, Rewşen ji dayik û ji bav Bedirxanî bû, bi zaroktiya xwe çar salan ji jiyana xwe li Iştenbolê derbas kir, ta sala 1913an ku Tirkan Bedirxanî sergûn kirin bo herêmin cihereng ji Rojhilata Navîn, ku Rewşen neçar ma bi bavê xwe û apên xwe re wekû Yûsiv Bedirxan vegûhêze bo Paytexta Sûriyê Şamê û li wir bicî bibe.

Di sala 1923an de Rewşen Belgenamêya xwe ya xwendinê ji mamostexaneya Şamê wergirt wekû yek ji serkeftirîn mamosteyên Sûriyê, piştir



di navbera salên 1925-1928-an de wê li Bajarên Umanê û Kerkê li rojhilatê Urdûnê kar kir, û di sala 1928an de vegeriya Şamê û Zimanê Ferensî li dibistana «Layîk ya Ferensî» xwend, Rewşen seranserê jiyana xwe mamostetî di gelek dibistanên Şamê de kir wekû «Xewle bunt El Ezwer û El Exyeliyê», û sala 1934an ve ku ew tevî Komela »Yekîtiya Jinên Sûriyê« bû û nûnertiya Welatê Sûriyê di Kongira Qahîrê de di sala 1944an de kir, di sala 1947an de wê di Dezgeha Sûriyê de kar kir ku wê çîrok di beşê zarokan de pêşkêş dikirin, û gelek çîrok û fêrdanên wê di rojname û Kovarên Sûriyê de hatine belav kirin û weşandin.

Xebatkara Kurd Rewşen di sala 1935an de bûbû hevîna lawê apê xwe lêkolîner û zanyarê zimanzan Mîr Celadet Bedirxan ku ew bi hev re mil bi mil ji bo pêşvebirîna zimanê Kurdî dixebitîn, û Xwedan keçek da wan ku navê wê kirin Sînem Xan û lawek navê wî kirin Cemşîd, Rewşen û Celadet 17 sal bi hev re derbas kirin ta koça dawî ya Mîr Celadet di sala 1957an de, piştî koçbûna Mîr Celadet jina wî Rewşen bi tena xwe rêça wî şopand û xebata xwe berdewam kir, ku wê di warê wergerandinê de ji Kurdî û Tirkî bo Erebî kar dikir, çimkî ew bi zimanên Kurdî, Erebî, Tirkî, Ferensî, Ingilîzî, û hin ji Elmanî daxivî, herwiha di warê nivîsandinê de ta roja koça xwe ya dawî di 1 Pûşberê ji sala 1992an de dixebitî, û ev hin ji Pirtûkên ku wê nivîsandine û wergerandine:

- 1- Bîranînên Mamosteyekê, ji sê beşan 1954z.
- 2- Evîn û azariyên min, pirtûk bi seranserî 1953z.
- 3- Bîranînên Jinekê 1953z.
- 4- Nameya Gelê Kurd, wergerandin 1954z.
- 5- Rûpelin ji wêjeya Kurdî 1954z.
- 6- Bîranînên min, Salih Bedirxan 1991z.
- 7- Nameyek bo serokomarê Komara Tirkîyê 1990z.



Wêjeya kurdî

Hisên Elsîno

Wêjeya Kurdî, di dîroka gelê kurd de ji demên herî girîng e, pênasa wêjeyê: Em dikarin bêjin ku ew hemû berhemên nivîskî ku kurdî hatine nivîsîn, ku ew li ku hatiye dîtin nivîsandina berhemên wêjeyî yên Kurd bi her çar zaravên sereke (Zazakî, Goranî, Kurmancî, Soranî). Di Wêjeya kurdî de nivîs, helbest, herweha çîrok, roman, şano û rexne hen e. Metelok, Gotinên Pêşyan û rêçe, Helbet hemû be zimanê kurdî hetina nivîsandin.

* Cureyên wêjeya kurdî:

Zazakî - Wêjeya Kuranî:

- Yek ji berhemên wêjeyî ya yekem ku bi zimanê kurdî hetî nivîsandin ew helbest bû ji sedsal (7) ne. û Ew zaravê hurmaniye hatiye nivîsandin. û ew helbest li ser dagîrkirina misilman dipeyive, û sernivîsa wê helbestê «Hurmizgan» e.

- Bibîr bînin, hin ji hozanên û nivîskarên zimanê Goranî yê ku bi nav û deng (Farsî Dinurî, Mustafa Bisaranî, Mihemed kandulî, Xana Qubadî, Şeyda Hewramî) .

- Hêjayî gotinê y: Zazakî û Goranî ew zimanên edebî li gelek devran mîna Kurdistana Iraqê, Îranê û Tirkîyayê di hate bikaranîn

Wêjeya Soranî:

- Berhemên wêjeyî di Soranî tenê di dawîya sedsala 18'an û destpêka sedsala 19'an de xuya bû. (Nalî) yekem Helbest bi vî zaravî nivîsand, û piştî wê (Şêx Raza Talebanî) û (Hacî Qadirê koyî) pê nivîsandin. Tevî ku di dawîya salên

destpêka xwe de. Wêjeya Soranî pêşket Bi taybetî di dema destpêka sedsala 20'an de, Piştî Soranî wek naskirina mezin ya Kurdan li Kurdistana Iraqê ye.

- Bibîr bînin, hin ji hozanên Soranî yên be nav û deng (Abdullah Goran - damezrênerê ayeta helbesta azad, bi zimanê kurdî) - (Şêrko Bêkes: helbestvanê Enfalê ye).

Wêjeya Kurmancî:

- Ji berhemên herî girîng ên ku ji bo wêjeya Kurmancî, trajîdiya (Mem û Zîn) e ya ku Ehmedê Xanî (1651-1707-) ew nivîsand. Ev çîroka evîneke mezin bû, ku di dawiyê de mem dimerec û zîn ji gêhê wî, li kêleka hev hatin veşartin. û ji berhemên din yê ku girêdayî Wêjeya Kurmancî ne: karê olî yê Êzîdî, Ev di formê kevneşop Kurmancî de, ku ew di wextekî di sedsala 13'an de hatiye nivîsîn. û li gorî dîroka edebiyatê, Ev hate gotin ku ji aliyê (Şêx Hesên) ve hate nivîsîn. û rola girîng yê ji her du helbestvanên ku roleke mezin di pêşxistina wêjeya Kurdî de leystine, (Feqê Teyran - Melayê Jizirî) ji bîr nekin.

- Bibîr bînin, hin ji hozanên û nivîskarên Kurmancî yê ku bi nav û deng in (Eli herîrî, Ehmedê Xanî (Mem û Zîn), Melayê Jazirî (Helbestvan Sufî navdar), Ismail Bayezîdî (nivîskarê ferhenga Kurmancî - Erabî - Farsî - ji bo zarokan).

Wêjeya Kurmancî ya nûjen:

Yekem rojnameya Kurmancî bi navê «Kurdistana» li Qahîreyê di sala 1898 hate weşandin. Rola Kurd li Yekîtiya Sovyetê ji bîr nekin, tevî hejmara wan kême bû. û yekem alfabeyên kurdî latînî, ye ku ji aliyê helbestvan û nivîskar (Mîrc Celadet Ali Badraxan) ve hate çikirin.

- û ji kesayetên sereke yên wêjeya kurdî Kurmancî jî (Mela Ehmed Namê, Qedrî Can, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Salim Berkat) e.

* Helbestvan û nivîskarên kurd di sedsala bîstan de:

emê hinakan ji wan bêjin (Tofiq beg Mehmud axa, Celadet Ali Badraxan, ErEb şamilof (Erebê şmo), Cegerxwîn, Ebdullah Goran, Osman Sabrî, Hêmen Mukryanî, Şêrko Bêkes, Cemal nebez, latîf Helmt, Ebdullah Pêşew, Rafiq Sebrî û Mihemed ozon) e. ■

Xwendina zarokan, stûbariya mal û dibistanê ye.

Hekîm Ehmed.

Bêguman, karê fêrkirinê ji karên zehmet tê dîtîn, ji ber hoker û mercên pêve girêdayî û di hundirê vî karî de peve gelicî. Fêrkirin ne tenê guhestina agahiyê ye, lê belê, gihandina agahiyê bi awayê hêsan ku şagirt sûdê di jiyana de jê werbigire, herwiha avakirina sistemekê ji nixê civakî yê xêrxwaz û têgehên zanistî yê sîdar di hundirê mirovê fêrkirî de. Wîlo fêrkirin bi hersê astên armancên xwe (zanist, tevger, wijdan) dibe avakirinek ji laş, derûn û hişê mirov re, da ku bikaribe bêhtir jiyaneke bextewer û serkeftî bi dest bixe.

Wênayên dibistanan li cîhanê cudabûneke mezin di navbera welatekî û yê din de didin xuyakirin, çimkî di dema ku li welatên pêşketî dibistan çarçewa saziya fêrkirinê derbas dike û dibe saziya jiyana û digihe asta ku serperîstiya jiyana zarokê li malê jî bike, di heman demê de, em dibînin ku li welatên din hîna bi awayê (Goşt ji te re û heşt ji me re) danûstandin di navbera malbatê û dibistanê de dibe, yan jî dijberiyek di navbera herduyan de heye, weke ku her aliyek bibîne ku yê din barê xwe davêje ser stuyê yê din. Zarok li hin welatan piraniya dema xwe li dibistanê diqedînin, mal jî dimîne cihê xewê, vehesanê û rojên betlanê, eger şaşiyek di perwerdekirinê de hebe jî, mamoste û rahêner berî malbatê pê dihesin, berî wan çareyan jî dideynin, ji ber ew yê di vî alî de pîspor in, lê li welatên me, nexasim yê di rewşên cengan de derbas dibin, zarok ne li malê, ne jî li dibistanê wî mafî wernagire û carina xwendina wî tiştêkî ne pêwîst tê dîtîn, ji ber wê, li dibistanên me, dibe ku zarokê di heftiyê de, carekê here dibistanê, wê carê jî heye ku bê pênuş û pirtûk be, herwiha piraniya polên dibistanan bê derî ne, pencere bê cam in, ji bilî nebûna pêdiviyên din û bi ser de dilsariya saziyên ku van dibistanan bi rê ve dibin bi kargêr û mamosteyên xwe ve.

Ji ber ku zarokên me destberiya pêşeroja me ne, ji ber ku hêja ne ku derfeteke ji vê geştir li pêş xwe bibînin, divê malbat jî rahêje stûbariya xwe, bi taybet di vê qonaxê de, ku nîşan bi tevayî tene şikandin û lawazkirin bi riya piştguhkirina xwendina wan bi behaneyên ku cengê her tişt wêran kiriye, lê eger ev rast be jî, bila ceng wijdanê me jî wêran neke, em ji erkên xwe re dilsoz bin, em... evên ku xwe mafxwaz



û bîrewer dibînin, divê em berî her tiştî di derheqê van nîşan de dadmend bin. Dayik dikare bi awane guncaw zarokên xwe bi dibistan û xwendinê ve girêbide, bav jî dikare çavdêriya asta wan û çûna wan a dibistanê bike, wîlo jî herdu di vegerandina waneyan de û alfkariya zarokan li mal beşdar bin.

Tevî ku gelek aliyên paşketina xwendinê ji malbatê û mamosteyan mezintir e, lê bêguman ew di vê mijarê de xwedî bandor in, eger danûstandin li ser rewşa fêrkirin û perwerdekirina zarokê, di navbera her du aliyan (Dibistan û malbatê) de bibe, wê encamine baş û gelek sûdê û destkeft hebin, ji wan ku guhdana malbatê dihêlê kêmasiyên dibistanê kêmbibin ji ber dema fêrkirinê dirêjtir dibe û kesên alîkar pirtir dibin, herwiha dema dê û bav li xwendina zarokê dipirsin, nêzîkbûn û heskirin çêdibe û zarok bi xwe bawer dibe ji ber kesine ku jê hes dikin nêzîkî wî ne, ji aliyekî din ve şagirt dibîne ku agahiyên zanistî li dibistanê û malê weke hev in, ev dihêlê ku sibe di jiyana xwe de sûdê ji wê xwendinê werbigire ji ber ew bi zanîn û çandê bawer e û dizane ku rastî di jiyana de li ku be her ew e.

Helbet, beşdariya dê û bavan di fêrkirinê de bê kelem û alozî jî derbas nabe, ji ber ne hemû dê û bav dikarin perwerdekar û mamostene serkeftî bin, ji ber wê gereke lêvegera wan di vî karî de mamoste û dibistan bin, çî derbarê wane û babetên mijdar di pirtûkên fêrkirinê de û çî li ser awayên fêrkirinê yê hêsan ku di demeke kurt û bi westaneke hindik armanca waneyê pêk were, nexasim ku asta dê û bavan di xwendinê de nizim bê yan ew gelek dem û mijûliya xwe bidin karên xwe, ji aliyê erêkirina zarokan jî li ser vê mijarê, hinek xelat û gelek heskirin û bêhna fireh dihêlê kur û keç bibin şagirt û bav û diyan xwe mamoste bibînin.

Li dawiyê jî malbat bo zarokan, hembêza ewlehî û baweriyê ye, çiqas jiyana bi paş de vegere, civak û saziyên şarewanî ji hev bikevin an nema bi rola xwe rabin, malbat dimîne keleha dawî ji jiyana û heskirinê re. ■


نسبة رضا عامّة الناس عن عمل

المنظمات المدنية



100%

6



أما المنظمات المحلية فنسبة الإناث تغلب قليلاً على الذكور لعدم اكتفاء الراتب الشهري لاحتياجات الذكور.

ورضا الناس عن المنظمات التي تعمل في المجال الطبي مقبول جداً بنسبة ٩٠ ٪ ، أما المنظمات الإغاثية فهي محل شكايي الناس إذ لا يتجاوز رضا الناس عن عملهم ٤٠ ٪.

العوائق التي تقف في طريق المنظمات :

سياسية ٢٠ ٪

مادية ٢٠ ٪

أمنية ٦٠ ٪

وتساهم تلك المنظمات في إحداث التغييرات من خلال مساعدة العوائل المحتاجة وإعادة الحياة إلى المدينة المدمرة كما وساهمت في تفعيل دور المرأة من خلال ضرورة مشاركة المرأة في العمل المدني لحاجة المدينة إلى جهودهن وممارسة دورهن الفعال في المجتمع.

- واقع منظمات المجتمع المدني في مدينة عامودا :

مدينة عامودا بسبب صغر حجمها لا يعمل فيها سوى عدد ضئيل من منظمات المجتمع المدني، وأغلبها على الرغم من ضآلتها تعمل في مجال الورشات التثقيفية وتمكين الأطفال من بعض الأمور الحياتية كمساهمة في مساعدة المرأة الأم في المدينة، ويصل عدد المنظمات تقريباً إلى ٤ / منظمات عاملة، ولها نشاطات مختلفة تتراوح ما بين تمكين المرأة وتثقيفها وما بين توفير فرص عمل ملائمة لها، وتصل نسبة الإناث العاملات في هذا المجال إلى ٣٠ ٪ من سكان المدينة بينما نسبة الذكور العاملين تصل إلى ٤٠ ٪، وسبب هذا التفاوت هو نظرة المجتمع إلى عمل المرأة، تلك النظرة التي تحتاج إلى تغيير وبمساهمة من تلك المنظمات نفسها، على الجانب الآخر تقوم هذه المنظمات بإيجاد فرص من خلال ورشات توعوية للمرأة وللتعرف على حقوقها وواجباتها في المجتمع، إلا أن الصعوبات كثيرة التي تقف في وجه عملها فمنها المادية والسياسية والأمنية ولعل الأمنية تعتبر من أبرز الصعوبات التي تواجه عملها، كون عملها يحتاج إلى تمويل مادي يغطي نفقات الورشات والنشاطات التي تقوم بها.

- واقع منظمات المجتمع المدني في مدينة قامشلو :

تتميز مدينة قامشلو بأنها مركز تجمع لمنظمات المجتمع المدني العاملة على الأرض، وتقوم بنشاطات عديدة وملحوظة على الساحة، لكن على غرار كل المناطق الكردية فإن المعوقات كثيرة ومنها المادية على الأرجح التي تصل نسبتها إلى ٥٠ ٪ والأمنية إلى نسبة ٣٠ ٪، وتتراوح أعمال هذه المنظمات ما بين تقديم الإغاثة للمواطنين المحتاجين وأيضاً تفعيل دور المرأة من خلال الورشات المتعددة التي تقوم بها على مختلف الصعد فيما يتعلق بشأن المرأة في المدينة، ويصل عدد المنظمات المدنية العاملة في المنطقة إلى ما يقارب ١٥ / منظمة موزعة ما بين خيرية وإغاثية ومدنية تعمل في الجانب التوعوي الذي يزيد من فعاليات التحرر لدى المرأة خاصة، وبخصوص النشاطات الأخرى فإن تلك المنظمات تقوم بتفعيل دور الفرد من خلال ورشات عمل متعددة تقوم بواسطتها تسليط الضوء على جوانب الخلل في المجتمع برمته وتسليط الضوء على المشاكل التي تمر وتتميز بالخطورة إن لم يتم معالجتها من خلال الورشات أو الندوات التي تقام في مراكز تلك المنظمات.

المساهمون في الملف :

عمر أحمد /ديرليك

حسين السينو / درباسية

سالار صالح / حسكة

عز الدين صالح / سرى كانيه

فاخر عبد الله / كركي لكي

شيرين قمو / كوباني

جان تتر / عامودا

ياسمين حسن / ترين سبيه

واقع المنظمات المدنية في تربي سبيه :

هناك منظمتان تعملان داخل المدينة هما (مركز التنمية والمجتمع المدني ومؤسسة التأخي لحقوق الإنسان)، ويصل نسبة رضا المواطنين عن عمل تلك المنظمات إلى نسبة محدودة لأن عمل هذه المنظمات تقتصر في ورشاتها على النخبة وعلى أعضاء الأحزاب السياسية، ونسب العوائق التي تحول دون تقدمها : فمن الناحية المادية لا توجد أي عوائق أما سياسياً فتصل نسبة المعوقات إلى ٩٥٪ ومن الناحية الأمنية ٧٠٪ ، أما بخصوص نسبة العاملين في المنظمات المدنية فإن نسبة الإناث أكثر من نسبة الذكور وهي حوالي ٦٥٪ على وجه التقريب، ولم تساهم هذه المنظمات كدور في إحداث تغيير لأن الحديث عن هذا الموضوع لا يزال مبكراً بسبب حداثة وعدم مضي وقت طويل على مباشرتها بالعمل ضمن المدينة، وساهمت بتفعيل دور المرأة من خلال إقامة ورشات عمل حول توعية المرأة بحقوقها وإزالة القيود المفروضة عليها وتقوم كذلك بتوزيع منشورات وملصقات خاصة بالمرأة وحقوقها وواجباتها.

واقع المنظمات في مدينة كوباني :

قبل عامين كانت المنظمات المحلية وحدها تعمل في مدينة كوباني، وهذه المنظمات كانت تعمل في مجال الصحة أو الإغاثة، ولكن بعد حرب مدينة كوباني وتحرير المدينة، أي بحلول عام ٢٠١٥ دخلت منظمات أجنبية لتعمل إلى جانب المنظمات المحلية.

المنظمات الأجنبية التي تعمل في مدينة كوباني وعددها ١٤ منظمة مصنفة على شكل التالي :

المنظمات التي تعمل في المجال الطبي (منظمة أطباء بلا حدود _ هيئة الإغاثة الطبية من أجل سوريا _ منظمة ايوار)

المنظمات التي تعمل في المجال الخدمي (منظمة كونسنر _ منظمة ميرسي كور _ منظمة كير انترنشنال، منظمة آكت ناو فور جلدن)

المنظمات التي تعمل في مجال إزالة الألغام (منظمة دعم الكنيسة الدنماركية (Dsa) _ منظمة ماغ البريطانية _ هاندي كاب انترنشنال _ ومنظمة arr اليابانية)

حيث تم توقيف ثلاثة من هذه المنظمات مؤخراً، وبقيت فقط منظمة دعم الكنيسة الدنماركية، وذلك لاقتصار تلك المنظمات على عمل التوعية فقط، وعدم التمكن من إدخال الأجهزة والمعدات من الطرف التركي إلى مدينة كوباني للقيام بعمليات الإزالة.

أما المنظمات المحلية فهي مصنفة حسب عملها :

منظمات تعمل في مجال الإغاثة (منظمة جودي _ منظمة قدر _ منظمة شباب الرقة التطوعي في إغاثة في المجال التعليمي _ منظمة كوباني للإغاثة والتنمية)

منظمة تعمل في مجال التوعية (اتحاد طلبة الكرد في سوريا وألمانيا)

منظمة تعمل في مجال حقوق الإنسان وتقضي الحقائق (منظمة التأخي)

منظمة طبية (الهلال الأحمر الكردي)

منظمة ذوي احتياجات الخاصة (تيريج)

نسبة العاملين في المنظمات الأجنبية متساوية بين الذكور والإناث ٥٠٪ ذكور ٥٠٪ إناث، ماعدا فرق الإزالة في منظمات الألغام فهي تحصر في الذكور.

وتشجيع دورها الفعال في عملية التنمية، فبدون مشاركة فعالة للمرأة ستبقى عملية نمو المجتمع في حدها الأدنى، وهذا يفرض على منظمات المجتمع المدني زيادة الاهتمام بالمرأة وتشجيعها وتقديم التدريب والتأهيل لها لتطلع بدور أكثر فاعلية في المجتمع.

- واقع منظمات المجتمع المدني في مدينة سري كانيه:

لا يوجد في سري كانيه سوى منظمتين تعمل في المجال المدني هما مؤسسة التأخي Birați للديمقراطية و المجتمع المدني وكذلك مركز العدالة والبناء الغائب فعلياً، و الرضى عن هذه المنظمات جيد نوعاً ما بما يزيد عن ٤٠٪ تقديراً لما تقوم به من توعية ونشر لثقافة حقوق الإنسان والمرأة والطفل، بالرغم من عدم امتلاكها لبرنامج عمل واضح.

بالنسبة للعوائق التي تواجه عمل هذه المنظمات فهي كثيرة، تتقدمها العوائق الأمنية كالترخيص الواجب الحصول عليه للقيام بالنشاطات من قبل مؤسسات الأمن التابعة للإدارة الذاتية ووجوب الحصول على الموافقة لكل نشاط تقوم به هذه المنظمات، كما أن نقص الموارد البشرية وضعف التمويل تعتبر من العوائق التي تحول دون قيام هذه المنظمات بواجباتها على أكمل وجه، وبشكل عام تشكل العوائق الأمنية نسبة ٤٠٪ و البشرية ٢٠٪ و المادية ٤٠٪.

فيما يخص نسبة الذكور والإناث في هذه المنظمات فإنها متساوية تقريباً في المنظمتين الموجودتين في مدينة سري كانيه، حيث يشكل الذكور فيها حوالي ٥٠٪ والإناث ٥٠٪، وبالنسبة لدور هذه المنظمات في إحداث تغيير، فقد لعبت دوراً ضئيلاً حتى الآن نظراً لحداثتها وقلة خبرتها من جهة، وعدم فهم وإلمام شريحة واسعة من السكان بالمجتمع المدني وحقوق الإنسان من جهة أخرى، لذا فهي لم تقم بإحداث تغيير يزيد عن ١٥٪ بالرغم من أن مركز التأخي Bi-rafti للديمقراطية والمجتمع المدني نشط جداً وقام بعدة مشاريع في مجال حقوق الإنسان والمجتمع المدني، وكذلك مشاريع واسعة في مجال التسامح والعيش المشترك وتمكين



النساء عبر ورشات تدريبية متعددة .

تقوم هذه المنظمات بالعديد من النشاطات لتفعيل دور المرأة وتوعيتها وتمكينها وتعزيز ثقافتها بنفسها رغم عدم وجود منظمات خاصة بالمرأة في مدينة سري كانيه، كما إن تفعيل دور المرأة يتطلب مقومات كثيرة يعجز عنها المجتمع المدني بوقت قصير كالوعي المجتمعي وإرادة المرأة نفسها في القيام بدورها والمطالبة بحقوقها وحريتها والدفاع عنهما، أي إن دور هذه المنظمات في تفعيل دور المرأة لا يتجاوز ٢٥٪ في مدينة سري كانيه.

- واقع منظمات المجتمع المدني في كركي لكي:

هناك عدة منظمات في كركي لكي يصل عددها إلى ٩/ منظمات عاملة في المنطقة، ونسبة رضا عامة الناس عن عملها ونشاطها تصل إلى الـ 55% وتصل نسبة العوائق التي تحول دون إتمام عملها بالشكل المطلوب من الناحية السياسية إلى الـ ٤٥٪ والمادية تصل إلى الـ ٣٥٪ والأمنية ٢٠٪، كما أن نسبة الذكور أكثر بقليل من نسبة الإناث حيث تصل نسبة الذكور إلى ٦٠٪ بينما نسبة الإناث تشكّل 40%، وقامت هذه المنظمات من إحداث تغييرات عديدة منها تشجيع العمل الخيري ومساعدة العوائل المحتاجة وتنمية المجتمع وتشجيع ثقافة الديمقراطية وحقوق الإنسان، وعلى صعيد تفعيل دور المرأة، فقد قامت بتوعيتها من الناحية الثقافية وفتح المجال أمام المرأة للانخراط في العمل الميداني وتنشيط دورها إلى جانب الرجل.

منظمات المجتمع المدني في المنطقة الكردية ... واقع ومعوقات

العديد من الورشات والدورات والمحاضرات في شؤون إحياء المجتمع المدني وحقوق المرأة في الدفاع عن حريتها.

- واقع المنظمات المدنية في الحسكة :

بعد تراجع سلطة النظام السوري وأجهزته الأمنية وتوفير مساحة من الحرية ظهرت منظمات المجتمع المدني في الحسكة وإن كانت بخطوات خجولة، فعمر هذه المنظمات لا يتجاوز الـ ٤ سنوات، حيث تنشط على ساحة مدينة الحسكة أكثر من ٢٠ /

منظمة مدنية معظمها تعمل في المجال الإغاثي بسبب الظروف الاقتصادية السيئة المرافقة للنزاع السوري الحاصل، ولم تستطع تلك المنظمات تلبية الاحتياجات المتزايدة للسكان المحليين الأمر الذي ولد شعوراً بعدم الرضا عن عملها لدى عامة الناس، كما وبرزت سلبيات كثيرة رافقت التجربة القصيرة لهذه المنظمات منها أن العضوية تكون في أغلب هذه المنظمات قائمة على روابط أسرية أو عشائرية أو حزبية، الأمر الذي يتناقض مع أحد أهم المبادئ الأساسية في نشوء هذه المنظمات وعدم وجود التخصص في عملها حيث نجد أن المنظمة ذاتها تقوم بمهام الإغاثة والتنمية والصحة والمرأة والسلام الأهلي، كما أن الشريحة المستهدفة في أنشطتها ومشاريعها يتم اختيارها على الأغلب بشكل انتقائي، ومن جانب آخر تواجه المنظمات المدنية عوائق جمة تتوزع ما بين

المادية والبشرية وإجراءات الترخيص، إذ يجب على هذه المنظمات أن تحصل على الترخيص من قبل الإدارة الذاتية حتى تتمكن من ممارسة أنشطتها وأحياناً يُفرض عليها أن ترخص لكل نشاط أو مشروع، كما وتشككي من نقص الموارد المالية وضعف التمويل ونقص الكوادر البشرية المؤهلة التي أحد أهم أسبابها المباشرة هي هجرة الشباب خوفاً من التجنيد الإجباري كما ولا تستطيع أن تنشط في مناطق سيطرة النظام كونها تحتاج إلى الترخيص لدى مؤسساته الأمنية.

نسبة الذكور في هذه المنظمات هي أكثر من نسبة الإناث، ويمكننا القول بأن نسبة الذكور تبلغ حوالي ٧٥ ٪ في مقابل ٢٥ ٪ من الإناث وهذا يعود إلى الموروث الشعبي والتقاليد الاجتماعية السائدة التي تشكل عائقاً أمام تحرر المرأة ومساهمتها في بناء وتطوير المجتمع.

لا يزال مبعراً الحديث عن دور هذه المنظمات في إحداث تغيير في المجتمع أو الضغط على السلطات المحلية في سبيل تغيير البعض من سياساتها، فمعظم هذه المنظمات تنشط في المجال الإغاثي وهي وليدة حديثاً، ولا تمتلك الخبرة الكافية للتشبيك وتشكيل مجموعات الضغط للتأثير في مراكز القرار وتعديل السياسات لتكون أكثر إيجابية وملمية لطموحات المجتمع المحلي، وهذا يحتاج إلى فهم عميق لدور المجتمع المدني كجهاز رقابي على أداء السلطة.

ولا يزال دور المنظمات خجولاً في تفعيل دور المرأة وتعزيز مساهمتها المجتمعية، فمن أصل ٢٠ منظمة مدنية في الحسكة لا توجد سوى منظمة نسائية واحدة أي ما يعادل نسبة ٥ ٪ فقط وهذه النسبة ضئيلة جداً ولا تتناسب مع طموح مجتمع مدني يسعى إلى التنمية الشاملة في كافة المجالات، إذ تتطلب هذه العملية مساهمة واسعة للمرأة

شكّلت منظمات المجتمع المدني تغييراً جذرياً في بنية المجتمع الكردي منذ بدايات اندلاع الثورة السورية، وساهمت في إحداث تغييرات جذرية من خلال المحاضرات والورشات التي تقوم بها في أغلب المناطق الكردية، إلا أنها تصطدم في أحيان كثيرة بمعوقات ولا تقوم بوظيفتها بالشكل المراد لأسباب عديدة

- المنظمات المدنية في ديريك :

جغرافية منطقة ديريك جعلتها من المناطق الأكثر أماناً لجذب المنظمات الدولية ومنظمات المجتمع المدني، توجد في المدينة ١٠ / منظمات تعمل في مختلف المجالات الطبية والإغاثية والتعليمية والخدمية، ولكن على الرغم من انتشار هذه المنظمات فإن نسبة رضا الناس عنها لا تتجاوز الـ ٥٥ ٪ تقريباً.

تمت الكثير من العقبات التي تقف في وجه هذه المنظمات، منها المادية والأمنية والسياسية، أما المنظمات الدولية فهناك عوائق داخلية كالحسوبة في تعيين الموظفين وفي عملية توزيع المواد الإغاثية على المواطنين، لكن على الرغم من الصعوبات أخذت تلك المنظمات على عاتقها ورشات عدة للنهوض بالمرأة وتمثيل دورها من خلال التوظيف لذي وصل إلى نسبة ٦٠ ٪ .

- المنظمات المدنية في الدرياسية :

تتواجد في مدينة الدرياسية عدد من المنظمات المدنية والإغاثية المختلفة وهي وفق النسب التالية :

المنظمات المحلية ٢ /

المنظمات الفرعية ٣ /

المنظمات الإغاثية ٤ /

ونسبة الرضا عن عمل هذه المنظمات من قبل المواطنين تصل إلى نسبة الـ ٣٠ ٪ ، إلا أن هناك بعض الانتقادات الموجهة إلى عملها منها تأخير فترات المنح، أي هناك مدة زمنية طويلة بين كل منحة وأخرى ولا توجد برامج واضحة لعملها والمواد التي تمنح قد لا تلي الحاجة الحقيقية، والعوائق التي تقف في وجه هذه المنظمات كثيرة منها مادية وسياسية وأمنية وتصل نسبة الصعوبات المادية إلى نسبة الـ ٩٠ ٪ والسياسية إلى نسبة الـ ٥٠ ٪ أما نسبة المعوقات الأمنية فهي ٠ ٪، ولم تنسى هذه المنظمات تفعيل دور المرأة فأقامت

Dawiya şevê

Ibrahîmc Berces\Dirbêsiyê

Bi derengî mi şiyar kir
Leylana xewê vehişt
Bi awazên hejanî
Beyva zîvîn tari xemiland
Pençê tolaz mîna dêwekî
Mîna lawirekî pêxemberî
Bi melevanî min hlia
Dawiya şevê
Xunav li xunç û benepşan bêni jî
Li hevketin şûrên tazî
Çotek pizot hil pekîyan
Dax da hîstên mi mîna keya hiçamî
Bi maç û lepan bi dînahî
Dawiya şevê
Bi derengî mi şiyar kir
Zor sipas lehîya bi rûska ber bangê
Kofîya hevîr mêşî û xiftanê hingivî
Bê dengî bi awazan re girni jî
çen dî pez kovîyan Li kû Pên bilind
Bi qo çelan dî poşin hev
çendîn kevokan
Helîn bi maçan xemiland
Bi derengî mi şiyar kir
Wey nûşî çan bi tu her hebe
Roj baş Dawiya şevê ■

Bayê evînê

Sûzan Qasim

*Bayê Evînê li xaniyê min da
Her parçeyek avête derekê
Lê bêhna wê fireh ne bû
Careke dî hat û xwe li
heşt û ramanên min daê
xwe li bîranên min da
Wênayên min, bîranên min
belav kirin û li ezmana firî
û kire kenî ..lê dema firî
Nasnameya min bi xwe re bir
Îdî min xwe nasnekir
û min nezanî ez kîm e. ■*

لم اخلق إلا لأحبك

بيوار عموكا

بين راحتي يديه
أحبك بشراة النار للحطب
بل بأكثر منه ...
فأنا الذي يلتهمك ملايين المرات
بعينه و لا يشبع
أحبك بإخلاص الكردي النائر
الذي يموت برداً و جوعاً
بين سفوح الجبال العالية
في سبيل قضية بقائه
بل بأكثر منه ...
أحبك بطريقة لا تستطيع
لا الكلمات و لا المنطق
لا التصوف ولا الإلحاد
التعبير عنه ...
أحبك أحبك و سأظل
أحبك مدى الحياة
و بعد الممات
فأنا لم اخلق ... إلا لأحبك

بحثت عن قافية
لأكتب لك بها شعراً
فلم أجد في الأبجدية
حرفاً واحداً
قادراً على المعاناة
حرفاً واحداً
أمامك يستحق الحياة
لذا اعذريني ...
سأكتب كيفما كان
أحبك بكل ألوان الحياة
التي تعرفينها ...
و التي لم تعرفينها بعد
أحبك بحجم كل المجرات
التي اكتشفت ...
والتي لم تكتشف بعد
أحبك بجنون العاصفة
بل بأكثر منه ...
فأنا مجنونك الصغير
الذي يخبئ لك
كل فنون العشق

Seyran

Umer Ehmed

DÊRIK, dema ku ev nav tê gotin Eyn dîwar, çem Şeref û gelek warên din bala merov dikşîne. di roja îne û rojên taybet de Dêrik ji milletê xwe vala dibe û her kes xwe davê hembêza xuristê.

Gelo ev seyran û wargehên xweş çi bandorê li jiyana milletê DÊRIKê dike. Di vê rewşê alos ku sûiyê bigiştî tê de jiyân dike, me gelek kes dîtî û heştên xwe bi me re par vekirin. yek ji wan bavê azad dibêje: Seyran xatir xwestîna ji zivîstanê ye û guhartina heştên merovane ji alî sêsyolocî û fêzikiye û revandina hişê merov ji nûçeyên nexweş yê di jiyana me de .

Ji aliyekî din ve gelek guhartin çê dibe . Remziya hacî jic kovara Welat re dibêje: Seyran guhartina merovane û Dêrik gelekî xweşê dihêle ku merov hem pirsgirêkên jiyana xwe ji bîr bike.

Li Dêrikê gelek cihên xweş hene û milletê me ji hemo kantona cizîrê tî serdana havîngehên dêrikê dikin.



Em dikarin ji gelê xwe re zelal bikin ku ev wargeh li Dêrikê çi ne:

Çem Şeref 22 km an li rojhiata dêrikê dike ve li gel çemê dijle ye, gelek dar lê hene. Dareke lê heye navê wê dara bavê kale millet seredana wê darê dike ji bo bextê wan baş bike.

Eyn dîwar: Cihekî dîrokiye, 14 km an li bakur û rojhilatî Dêrikê dikeve, li Eyn dîwarê gelek cihên xweş hene –seqana mema-pira bafit(pira romanî) – heyaka.

Li başûrê dêrikê ciyayê qereçox (mosa sana) ew jî cihekî dîrokiye darek li wir heye nava wê darê kurkê rewan e, çîrokeke wê ya dirêj heye. bi kurtasî cihên xweş li bajarê Dêrika Hemkoc ya rengîn ev in. ■



Zimanê Kurdî di Goolê de, NERÎNÊN REWŞENBÎRÊN GIRKÊ LEGÊ

Faxir Ebdela



Xizmetguxzariya wergerê di Googlê dê(102) werdigerand,bi telfî kirna zimanê Kurdî hejmara zimanên ku ev xizmetguzarî wergitine dibe (103) ê ziman,bê gumane ev gava pîroz ji rêvebiriya Googlê cihê rêzdarî û rêzgirtinê ye,ji hêlekê ve ev yeka han ji guhdan û xzemxweriya derbarî paraştina ziman,kelpor û şûnamayên gelên cîhanê ji belabûn û windabûnê tê, ji hêla din ve xizmet guzariye bê pere ji mêvanê xwe re pêşkêş dike,di dawiyê de ev gav xizmeta aramanca rêxistina Yonisko dike li paraştina zimanê dayikê yên hemî gelan guhdar e.

Bi veboneyê Kovar Welat nerîn hin raghêner û rewşenbîrên Girkê Legê şopand.

Mamoşte Sebîh mamoştayên zimanê kurdî ye di derbarî vê yekê weha ji kovara Welat re axiv: "Biraştî derbaskirina zimanê Kurdî di Goolê de tiştêkî pir başe em weke Kurd gelekî pê kêfxweş dibin ku zimanê me jî giha vê aşteyeya bilind. Emê ji aliyê xwe ve hewil bidin ji bo pêşxistina zimanê xwe bi Googlê re alîkar bin,weke zimanzan çî ji me were xwestin ji bo ku zimanekî baş tede were weşandin ezê bê weştan jê re bixebitim,li dawiyê ji dil û can spasiya karmendên Googilê dikim.

Herweha raghêner û medyakar Berzan Hisên Liyanî ji kovara Welat re diyar kir: Çespandina zimanê Kurdî yê Hindo Ewropî di lîsta zimanên cîhanî de,li cem gelê Kurd Mîna xewnekê bû,nemaze piştî pêşketinên ku di rêzmana Kurdî de çêbûne û damezrandina tîpên wî yên zêrîn li destê mamoştayê pêşîn Mîr Celadet Bedirxan. Û piştî ku zimanê Kurdî derbasî Googlê bû û tevî (7000) zimanên din bû,di riya wergrandina yekser de,gelek aşteng û kelemên ku di riya raghêneran dibûrîn hêsan kir,îdî nema giringe em li jêderan vegerin.

Di dawiyê de dixwazim diyar bikim,ku wergera

kurdî di Googlê de nû ye,loma gelek caran encamên neyînî dide,ji ber vê yekê hêviya min ewe ku hemî û ekadîmiyên zimanê Kurdî pişkdariyê di serraştirina gotinan de bikin da ku em resenayetiya zimanê kurdî bi çespînin. Spas bo her kesê ji bo çespandina zimanê kurdî di Googlê de xebe tiye.

Nîfskar Biradosî Mîtanî nerîna xwe ji Welat re şîrovekir: Biraştî li cem min cihê kêfxweşî û şanaziye bû,dema min ev nûçe bihîşt ku dezgehek mîna Googlê zimanê Kurdî derbasî nav zimanên cîhanî bike. Ez wek mamoştayekî zimanê Kurdî dibînim ku gelek gotin hene wateyên wan ne di cihê xwe dene,lê di rojên ku bên de,bi alîkariya hin hevalan em ê karibin van şaşîyan çareser bikin,û tiştên nû,paqij û zelal derbasî Googilê bikin da ku gelê me sûde û mifayê jê wergir e.

Helbestvan Ronîstêr Mîrza ev yek weke mizgîniyekê ji gelê kurd re nirxand û weha ji Kovara Welat re axivî: Ez karim bêjim ev ji gelê Kurd re mizgîniyek bû,biraştî tiştêkî bi vî rengî ku çêdibe nemaze di warê zimên de,bê guman wê gelek bi nirx be.

Ji ber em tev dizanin ku ziman nasnameya gelan e,û dijjana gelan de tiştêkî herî balkêş e,heger em li zimanê xwe wedî dernekivin,biraştî emê di tariyê de bimînin.

Dema ku dezgeheke mîna Googlê zimanê Kurdî derbasî beşê zimanên cîhanî dike,ev diyar dike ku xebatek jê re hatiye kirin û zimanekî bi xwedî ye. Di dawî de ,ez gurzek gul diyarî Googlê û çî kesê bi vî karî rabû ye dikim,spas ji tevan re.

Cîhad Çaçû mamoştayê zimanê Kurdî ye,weha ji Welat re axivî: Gaveke gelekî giring û pêwîsete di vê qunaxê de,ji ber ku zimanê me di wan demên bûrî de qedexa bû,lê niha zimanê Kurdî bû jimarek di nav zimanên cîhanî de,bi taybetî yên ku di Googlê di bikartên. ■

Lêpîrsînnek derbarî Federasyonê.

Sîmav Hesên

Di roja 17 û 18ê Adarê de destfeya amadekar li bajarê Rimêlan bo damezrandina sîstema Federasyonê li Rojava – Bakurê Sûryayê hate ragehandin ,û ji wê demê ve ta roja îro, ev mijar bûye mijareke sereke bo piraniya torên Medyayê yên Erebî û yên Cîhanî ,û ji aliyê xwe ve, rêjîma Sûryê û her weha opozisyonê wî welatî jî, nerazîbûna xwe derbarê vê sîstemê bo rêveberiya herêmê, Nîşan dan.

Ji aliyê xwe ve hin siyasatmedar û rewşenbîrên Herêmê jî li dijî vê sîstemê radiwestin , Sekretêrê Partiya Çep ya demokrat a Kurd li Sûryayê Şelal Gedo dibêje : “çalakvan û Rêxistinên sivîl û hemû welatîyên Kurd ku li herêman Kurdî kar dikin li ser Federasyonê li hev dikin, û bawer im ku ev Sîstem dê karibe Sûryê vegeheke weke berê “ lê derbarê Federasyona ku li Rimêlanê hate ragehandin ,Gedo dibêje “Federasyona yek alî ku li Rimêlanê hate ragehandin ,tu bingeheke wê ya yasayî tune ye, û pêkanîna federasyonê bi şeweyeke praktîk dê zehmet be. Siyasatmedar ji vê federasyonê ne razî ne û taybetmendiya Kurdan di vê federasyonê de ne diyare “ her weha gedo dibêje ku egera wê yekê heye, ku taybetmendiya Neteweke din di vê federasyonê de hebe bi taybet ji ber ku proseya rizgarkirina Reqayê li pêş hêzên leşkerî yên vê herêmê heye.

Lê Rojnamevan Mecîd Muhemed nerîneke wî ya cuda heye û dibêje



ku ragehandina sîstema Federasyonê gaveke mezine, û dibêje “ragehandina federasyonê gaveke ji bo avakirina Sûryaya nû xwedî sîstemê nû , û ev yek dê alîkar be da ku hemû pêkhate di avakirinê de beşdar bin”, Muhemed her weha destnîşan dike ku hin têbînî hene, ya sereke ew e ku hin aliyên sereke di tevgera Siyasî ya Kurdî de di kongirê de ne beşdar bûn, her weha dibêje “ya herî giring ,ku destfeyên Rêveberiya Xweser, TEV-DEM û PYDê karibin rewşa navxweyî xweş bikin û cardî pêwendiyên wan bi Encumena Nîştîmanî ya Kurd li Sûryayê ENKSê re xurt bibin, da ku ev sîstem nû di çarçoveya nerîneke giştî bo rewşa kurdî bi şeweyekî yasayî belav bibe û bi vî awayî tu kes nikare li dijî daxwazên pêkhateyên herêmê raweste”. Ji aliyê xwe ve rojnamevan Delîl Silêman dibêje ku ev piroseya pêşniyarkirî gaveke erênî ye ber bi Sûryayeke Demokratîk ve, û dibêje “ev pirose dê kilîta çareseriyê be bo Sûryaya siberojê, ku hemû pêkhateyên herêmê dê têde beşdar bin “.

Rojnamevan Kerem Yusiv jî dibêje ku ev sîstema nû dê mafê Kurdan her weha yê hemû pêkhatiyên biparêz e, ji ber li gor nerîna wî “girêdana bi Hikûmeta Navendî mafê hemû pêkhatiyên herêmê dixwe, û tevî ku piroseya Hemahengiya Opozisyonê jî Nenavendî ye, lê hê jî ew nikare xwedî biryar be, yan jî biryara wê ne cidî ye”. ■



Hat xweş Buhar

Dilşad Xalid

Ji ber rewşa ewlehî ya ne baş li Sûryayê bi tevayî û Rojavayê kurdistanê bi taybetî, ev Çend buhar bi ser welatîyên rojavayê Kurdistanê ve derbas dibin bêtî ku karibin ji malên xwe ber bi çolê de derkevin û geşt û seyranan bikin.

Ava Ehmed ji Kovara welat re wiha axivî: “piştî êrîşên Daişê li ser herêmên me tirs çê bû û me nema wêrîbû em derkevin seyranan, ne tenê wilo Newroz jî li me bû hisret, bi rastî em gelekî jî bubme yên terorîstan ditirsîn”.

Piştî ku şervanan li rojavayê kurdistanê hêza terorîstan şikand û ew dîrî dever û herêmên kurdî xistin diyar dibe ku hêdî hêdî rewş vedger wek berê û cardin xelk jiyaneke normal dijîn.

Ahî Emîn ji Kovbara Welat re dibêje: “Tevî ku hîn hinek tirs di dilê me de maye, lê piştî ku Daiş ji herêmên me dîr ket vê yekê vehesane li ba me çêkir û em cardin ji malên xwe derdikevin û bi xweşbûna buhar kêfxweş dibin”.

Diyar e tirs ji Daişê nema ye, lê metirsî niha ji aliyê Artêşa tirkîyayê çêbûye ji ber ku di dema dawî de piştî operasyonên wê artêşê li ser herêmên kurdî li bakurê kurdistanê carnî hin topan bi ser rojavayê Kurdistanê jî davêje.

Kawa Yasîn dibêje: Di buhara salên berê de ji ber

ku ew dever gelekî xweş bû em li Qamişlo derdiketin çola nêzîkî sînorê bakurê kurdistanê, lê di dema dawî de ji ber top û guleyên artêşa Tirkîyayê çend welatîyan jiyana xwe ji deşt dan û hinek jî birîndar bûn lewra tirs li cem me çêbû û em nema dikarin biçin wê deverê.

Di dîrokê de naskirî ye ku girêdaneke xurt di navbera mîletê Kurd û xurustê de heye û ew girêdan wê ne bi êrîşên terorîstên Daişê ne jî bi topên artêşa Tirkîyayê were birîn .





Li Hesekê... Hejarî Pir Dibe

Salar Salih

16

Bi sedema rewşa abûrî ya dijwar û xirab, rêjeya mirovên hejar û perîşan li Hesekê roj bi roj bilindtir dibe, û rêjeya malbatên ku di jêrî xêza perîşanîyê de dijîn herweha bilindtir dibe, û her roj malbatin nû dikevin jêr vê xêzê de bi sedema bilindbûna nirxê dolarê Amrîkî li himber lîreya Sûrî, û ev yek zirarek mezin li kesên perîşan dike, û hew dikarin pêdeviyên xwe yê sereke bo jiyanek bi rûmet dabîn bikin.

Sedemên sereke yê ku diyardeya hejariyê firehtir dikin vedgerin rewşa şerê navxweyî yê ku li Sûrya tê kirin ji pênc salên borî ve, di serî de buhabûna nirxê dolar li himber lîra sûrî, ev lîre pir lawazkir û îdî welatî hew dikare bi berhemê karê xwe yê mehane bêtirî deh rojan bijî, herweha tunebûna derfetên kar li pêşiya nişteciyên bajarê Hesekê kêşeyeke bê çareserî ye.

Lewra kesê bêkar li vî bajarî ji neçarî di koçberiyê de dirame, ji ber ku tu derfeta dîtir li pêşiya xwe nabîne, nebûna delîveyên kar bi sedema rewşa qeyranê ya berdewam sedemeke sereke bo koçberiyê, û dema ku kar tune be, wê çaxê jî berdewambûna jiyanê li xaka welêt asteng dibe, û birçîbûn dibe para kesê bêkar, û neçar dibe ku berê xwe dide sînoran bi mebesta ku karekî ji xwe re bibîne û ji metirsiya birçîbûnê riha bibe, di vî alî de ew dezgeh û komeleyên xêrxwazî jî di pêşkêşkirina alîkariyan ji kesê hejar re pir lawaz in, û şewazê kar van dezgehên bêtirî caran bê rêk û pêk e, û belavkirina alîkariyan li ser bingeha mirovtî yan dostaniyê tê kirin, û ev yek ziyaneke mezin dighîne kesê hejar û perîşan.

Ew malbatên perîşan ku derfeta koçberiyê ji wan re çênabe, û neçar li bajarê xwe dimînin, jiyanek aloz û hejar derbasdikin, ji ber buhabûna nirxê pêdeviyên sereke yê ku rojane divê derbasî malê bibin, û herweha nebûna delîveyên kar, û nebûna sistemekê bo parastina civakî, ku bikaribe van malbatên perîşan ji birçîbûnê biparêze, lewra diyardeya hejariyê roj bi roj berfirehtir dibe, û her roj kesin bêtir parsê dikan, û torikên qirêj û gemarê vedikin ta ku hinek alavên xwedî nirx bidin hev û bifroşin beramberî hinek pere.

Lê ne tenê kesê bêkar astengiyan di peydakirina pêdeviyên jiyanê rojane de dibîne, herweha ew kesê karker û fermanber jî, çikû ji ber buhabûna nirxê dolarê Amrîkî li himber lîreya Sûrî îdî mûçeyê fermanberan 70 ta 80 dolarî dike, û ev mûçe hew têra jiyanê kesekî tenê dike, wê çawa têra malbatekê bike ku çar yan pênc zarokên wan hebin, ev jî rengekî din ji hejariyê ye, ku mûçe tenê deh rojan têra jiyanê dike, û piştî meh bi giranî di ser malbatê re derbas dibe. ■

Rewşa perwerdê li Tirbespiyê

Yasmîn Hesen



“Zanîn ronahî ye û nezanî tarî ye” ji berê ve ev

hevok di mêjiyê me de hatiye çandin, û em dizanin ku bê zanîn û perwerde tu carî civak û welat pêşnakevin, nagihin aştî şarîstaniyê.

Li bajarê Tirbespiyê û derdora wî perwerde berdewam e, gelek dibistan li Tirbespiyê hene, ev dibistan li ser sisê aştan e, aştî pêşî dibistanên seretayî ne ewjî jimara wan şeş dibistanin, navê wan evin: (Mecdel şems - Ehmed Higlîş - Ayşa - Xalid bin Elwelîd - Hesan bin Eabit - Ebdulqadir Elcezayirî), diwem dibistanên amadekariyê ne, ew jî jimara

wan çar dibistanin ku dido ji wan yên qîzane û navê wan evin: (Nazik elmela'îka - Fêsel Elhisên), û dido yên lawan e, navê wan evin: (Emru bin Ela's - Elkindî), siyem dibistan yên bilind in, jimara wan du dibistanin, yek jiwan ya

qîzaye, navê wê (Xewla bint Elezwer) e, ya din ya xorta ye, navê wê (Fayiz Mensûr) e.

Her wiha li Tirbespiyê peymangehek taybet bi amadekirina mamosteyê zimanê kurdî heye, ew jî bi navê (şehîd Hesan Ibrahîm) e, ev peymangeh mamosteyên zimanê kurdî amade dikê, da ku ev mamoste amadebin derbasî nava dibistana bibin. Li dibistanê seretayî refên (1-2-3) perwerde bi sisê zimana ye (kurdî - erebî - suryanî), lê refên ji (4an ta 12an) perwerde bi zimanê erebî ye.

Bandora rewşa xirab ya ku herêma tê re derbas dibê, bê guman li ser rewşa perwerdê hatiye kirin, cudahiyeke xuyayî dinavbera rewşa perwerdê ya berî kirîzê û ya di nava kirîzê de heye ■

إخلاق المعابر الحدودية يزيد من معاناة الكوبانيين

شيرين قمو

من المعلوم أنّ مدينة كوباني تعاني حصاراً خانقاً منذ قرابة أربعة أعوام، إذ أنّها كانت محاصرة من جهاتها الثلاثة باستثناء الطرف الشمالي «حدودها مع تركيا» حيث كانت تركيا هي المنفذ الوحيد الذي يتنفس منه الكوبانيون هواء الحياة ويرون فيه باب الخلاص بأرواحهم إن اضطروا لذلك، فكانت الدولة التركية تستقبل الحالات المرضية الحرجة، وكذلك تسمح بدخول بعض المواد التموينية إلى المدينة، ولكن ما تغير في الأونة الأخيرة، أنّه بعد سيطرة قوات سوريا الديمقراطية على معظم جغرافية الشمال السوري، وتحقيقها لانتصارات عسكرية، عمدت الدولة التركية إلى إغلاق حدودها مع روجافا تماماً، حيث أنّها امتنعت عن استقبال المرضى، حتّى ذوي الحالات الحرجة جداً منهم، سواء من المقاتلين أو المدنيين كما أنّها عمدت إلى إغلاق بوابة مرشد بينار في وجه المدنيين ممّن يودّون دخول تركيا، ففرضت حصاراً شديداً على الحدود، حتّى أنّها أمرت جنودها على الحدود بإطلاق النار على المدنيين الذين يحاولون اجتياز الحدود سراً «تهريباً»، وبالفعل تمّ تنفيذ تلك الأوامر حيث هناك حالات موثقة ممّن فقدوا حياتهم على يد الجند التركية أثناء عبورهم الحدود.

نعم، كوباني في حالة إغلاق تامّ لجهاتها الجنوبية والغربية والشمالية الآن، ويبقى الاستثناء طرفها الشرقي مع مدن الجزيرة، لكنّ تلك المدن بدورها

محاصرة من كافّة أطرافها.

إنّ إغلاق معبري «مرشد بينار» ومعبر «سيمالكا» الحدوديين يزيدان من عمق المعاناة الإنسانية في روجافا عامّة وكوباني خاصّة، إذ أنّ الحالات المرضية المستعصية في كوباني يتمّ نقلها الآن إلى مدينة قامشلو، رغم بعد المسافة، كما أنّ الخضار والفواكه تأتي من مدن الجزيرة إلى كوباني، وهذا ما يضاعف الأسعار نتيجة نقص المواد الغذائية والخضار وعدم سدّها لحاجات الناس في مدن الجزيرة أصلاً، يضاف إليها تكاليف النقل الباهظة، كما أنّ المساعدات الإنسانية العالقة على الحدود والمرسلة من قبل المنظمات الأجنبية إلى مدينة كوباني المنكوبة تجعل وضع معظم العائلات معسورة الحال في حالة متردية.

بدورها المنظمات الإنسانية المحلية في مدينة كوباني أطلقت نداء استغاثة إلى المنظمات الدولية كي تتدخل فوراً لفتح المعابر الحدودية مع روجافا، وخاصة معبر «مرشد بينار» المنفذ الوحيد للمدينة على العالم، إذ أنّ المدينة ما زالت تعاني حالة حرب ودمار كامل، ومن ناحية أخرى يؤدي إغلاق المعابر في وجه المدينة إلى تأخير في عملية إعادة إعمار المدينة، وذلك لعدم السماح بدخول موادّ البناء إليها، ومن المعروف أنّ معظم المنازل في حالة مزرية نتيجة المعارك والقصف الذي تعرّضت لها المدينة.

كلّ هذا يتمّ في الوقت الذي يحاول العائدون إلى كوباني البحث عن أبسط شروط الاستقرار وتأمين حياة بسيطة بعيداً عن اللجوء ومعاناته، لكنّ تلك الحدود التي أذاقتهم المرارة أثناء نزوحهم وبعده، تعود لتضيّق الخناق على حياتهم داخل مدينتهم المنكوبة. ■





LI DÎK BI PIRS e.

Kemal alsîno (Nêçîrvan)

Guh bide min ey
heval
Tev xwişk û birên
delal

Dibêjim we ev çîrok
Ji mêtve ye ne nihok
Dibêjin hebû yek pîr
pir gernas û xwedî bîr
Jê re bes hebû yek law
xwedî tevlêvî û haw
Wî guh ne didêra bav
Li nek wî gotinên xav
DI rojekê ji rojan
Ne xuya bû dîkê wan
Pîr deng kire Kurê xwe
Her bi pirse l' dîkê xwe
Kesê îro dîk dizî
Çi b' dest keve wê bivî
Kur bi ken digot e bav
xurifyo bese lavlav
Kiyê were bive Dîk ?

Bilî Rêvî û wawîk
Heger Dîk çûbi b' dizîn
Bi kêr wî nayê dengîn
ji ber gi l' Dîk bi gerim
Gundî wê j' mi r' kin şerim
çi nerîn e ev nerîn
pîrs şermtir be ji dizîn
serê we na êşînim
Ezê zû veçîrîn im
Piştî Dîk çû b' du rojan
Di vê rê de çû Beran
Kur li wir ma şerpîzî
Awir ji bav didîzî
Pîr deng Kirî Kur ê xwe
Her bipîrs e l' Dîkê xwe
Heger te l' Dîk Pîrsî ba ?
wê ev Beran ne çû ba

Kur derdiket ji derî
Lê li Beran ne gerî
Derbas dibû roja neh
Ga çû b' dizîn şeva deh
Dema xeber giha bav
Lê disot dil û hinav
Pîr deng Kirî Kurê xwe
Her bipîrs e l' Dîk ê xwe
Kur li bav vedigerand
Bes te me b' Dîk hetikand
Ez dibêjim te çû Ga
Tu d' bê Dîkê Mîrîşka
Dîk derxîne ji serî
were li Gê bigerî
Pîr bilind Kir deng ê xwe
Her bipîrs e l' Dîkê xwe
Heger Tu l' Dîk bigerya ?
Ne Beran diçû ne ga
Birîn Ku derman nebe
Di laş de her digere
Yê ne pirse l' halê xwe
wê wendak e mafê xwe ■



Ya zehmet ku em dûrî welatê xwe bin!



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٢٨) ٢٠١٦/٥/١